# Kurtenivîsek li ser danasîna Yekîtiya Jinan

Yekîtiya Jinan 78.mîn salvegera xebat û têkoşîna xwe derbas kir. Ev rrêxistina han 52 rojan piştî ragihandina Komara Kurdistanê ji aliyê Pêşewa Qazî Mihemed ve hat damezrandin.

dom»R:9




*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (466)19-03-2024 Buha (1000) Tûmen*

# Yekgirtina netewî û hewcehiya siyaseta 360 pileyî

Pêdivî ye ku siyasetek neteweyî ya 360-pileyî were fikirîn da ku guhdarîkirin û çareseriyên dîplomatîk ên navxweyî pêşve bibin.

Şoreşa Jîna li Kurdistan û Îranê hem li ser asta navxweyî, hem li ser asta Îranê û hem jî li ser asta navdewletî wek katalîzor bû sedemek ji bo zelalkirina potansiyel û metirsiyên li pêşiya civaka Rojhilatê Kurdistanê.

dom» R:6

# Şeş sal li ser dagîrkirina Efrînê derbas bûn

Herêma Efrînê, piştî dagirkirina wê di 18ê Adara 2018an de, bi awayekî sîstematîk rastî komkujî û tawanên dijemirov û bişaftin û guhertina demografî dibe, ku piraniya xelkê wê yên kurd hatine koçberkirin û li kampên bêserûber li Helebê dijîn, li ser mal û milkên kurdan Ereb û Turkmen têne bicihkirin.

dom» R:8

# Peyama pîrozbahiya Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat bi hilkefta cejna Newrozê û hatina sala nû

Welatiyên xoşewîst!

Xelkêl xebatkar û azadîxwazê Kurdistanî!

Malbatên serbilind ên Şehîdan û girtiyên siyasî!
Bi hilkefta hatina cejna Newrozê û nûbûna salê, ji dil ve em pîrozbahiyê li weyê xoşewîst dikin û em hivîdikin ku sala nû, salek bi xêr û xweşî û pir destkevt be bo xelkê Kurdistanê û tevgera siyasî-netewiya gelê me.

Bûne û rêûresmên Newrozê ya îsal bi vê germ û guriyê ku heyamek e bi rê kevtiye û heta niha jî berdewam e, dîmeneke civan û manadar daye Newroza îsal ku hem cihê hiviyê ye û hem cihê şanazîpêkirinê ye.

Hivêderî bi vê sedemê ku gelê me bervajiyên xwast û îradeya desthiltdarên Komara Îslamî, xebatkar û xweragir ma û teslîmê siyaseta paremayî û daxistiya wan nebû.

Her wekî çawa ew dîmenên civan li vê Newrozê de bi cîhanê da nîşandan, bervajiyê îdeolojiya Komara îslamî û siyaset û bernameyên wan ên li 45 salên derbasbûyî de bû.

dom» R:2




# Peyama rêzdar Mistefa Hicrî bo salroja kîmiyabarana Helebçê

Rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta 16ê Adarê, salvegera kîmiyabarankirina Helebçê ji aliyê rêjîma Beis a Êraqê ve, peyamek belav kir.
Deqa peyamê wiha ye:
16ê heyva 3 a Zayînî, 36emîn salroja karesata komkujî û kîmiyabarankirina Helebçê ye, li vê rojê de sala 1988 a Zayînî de ji aliyê hikûmeta berê ya Îraqê vê bi bombên kîmiyayî êrîş bo ser bajarê Helebçê li başûrê Kurdistanê hate kirin.
Li encamê de gorî zaniyariyan nêzî 5 Hezar kes ji xelkê vî bajarî şehîd bûn û hezaran kesên dinê jî birîndar bûn.

dom» R:4

# Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 8ê Mars, roja cîhaniya jin peyamek belav

Bi hilkefta 8ê Mars, roja navnetewî ya jin, em bi germî pîrozbahiyê li we dikin û serkevtina xebata ve ya rewa li dijî çewsandin, cudatîdanîn û nevekheviyan, bi hivî dixwazin.
Rojhilatê Kurdistanê, meydana destpêkirina nûtirîn û mezintirîn serhildan bi dijî sitem û tawanên li hember jinan û landika dirûşma cîhangîr a "Jin Jiyan Azadî", dîrokek teybet li xebat û sekinîn li hember rêjîma kevneperest û dijî jin a rêjîma Îslamiya Îranê de heye. Li vê derheqê de xelkê Rojhilatê Kurdistanê û herwisa jinên li Îranê, dîrokek hevşêwe hene.
Hekî netewa bindest û mafxwaz a Kurd li Îranê, her ji yekem rojên hatinaserkar a rêjîma Îslamiya Îranê, şahidê dijayetiya vê rêjîmê digel maf û daxwaziyên wan bû.

dom» R:3

# Peyama pîrozbahiya Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat bi hilkefta cejna Newrozê û hatina sala nû




**Welatiyên xoşewîst!**

**Xelkêl xebatkar û azadîxwazê Kurdistanî!**

**Malbatên serbilind ên Şehîdan û girtiyên siyasî!**

Bi hilkefta hatina cejna Newrozê û nûbûna salê, ji dil ve em pîrozbahiyê li weyê xoşewîst dikin û em hivîdikin ku sala nû, salek bi xêr û xweşî û pir destkevt be bo xelkê Kurdistanê û tevgera siyasî-netewiya gelê me.

Bûne û rêûresmên Newrozê ya îsal bi vê germ û guriyê ku heyamek e bi rê kevtiye û heta niha jî berdewam e, dîmeneke civan û manadar daye Newroza îsal ku hem cihê hiviyê ye û hem cihê şanazîpêkirinê ye. Hivêderî bi vê sedemê ku gelê me bervajiyên xwast û îradeya desthiltdarên Komara Îslamî, xebatkar û xweragir ma û teslîmê siyaseta paremayî û daxistiya wan nebû.

Her wekî çawa ew dîmenên civan li vê Newrozê de bi cîhanê da nîşandan, bervajiyê îdeolojiya Komara îslamî û siyaset û bernameyên wan ên li 45 salên derbasbûyî de bû. Komara Îslamî û îdeolojiya paremayî ya vê bi dirîjahiya temenê desthilatdariya xwe, li dijî her cure şadî û keyfxweşî û zindîbûneke xelkê Îranê û Kurdistanê bûye.

Encama vê siyaseta çewt û dije mirovî, eva ye ku îro li Îranê li nav weletê herî xemgîn de cih girtiye, lê xelkê jiyanperwer û xebatkare Kurdistanê, neînku teslîmê vê siyaseta Komara Îslamî nebûye, belku her dem û bi taybet li Newroza îsal de me dît ku çawa û bi çi şêwazekê îradeya şad û bextewerjiyana wan bi ser xwasta rêjîmê bi ser kevt.

Lewma ew coş û xuroşa welatiyan, hem bo îro û paşeroja gelê me hivîder e û hem cihê şanazîpêkirinê ye, Çimkî îradeya çiyayî, berxwedana bivêraneya wan daxwaz û xwestên rêjîmê tûşî şikestê kirin.

**Hevniştimaniyên hêja!**

Ewa ku li Newroza Kurdewarî û Kurdistanê de bo me hemûyan bûye şanazî, her wisa bi hêsanî bi dest ve nehatiye.

Ev destkevta, encama xebat û rawestaneke mezin û serîneçemandineke dehan saleya xelkê Kurdistanê û hêzên siyasî ye ku li hember çi cur zordarî û tepeserkarî û bikaranîna hemû cure siyaset û pîlaneke Komara îslamî de serî neçemandin.

Lewma ji berê ve, Newroz li Kurdistanê de bi tenê hatina demsala Bihar û sala nû û guherîna salê nîne, belku hêmayek bo serîneçemandîn, geşekirin û serîhildan li hember hikûmeteke mirovkuj e ku bi hemî rê û şêwazan bi hemû alavekê, cehda fetisandina dengê mafxwazaneya gelê Kurd dide.

Hekî em wan her 2 biharên pîştî şoreşa "Jîna"yê berçav bigrin ku bi destê reş ê Komnara Îslamî, 10an û 100an ciwanên bivêr bi dilek tejî ji hêvî yên Kurd, li ser şeqam û li girtîgehan û li nava refên Pêşmergên Kurdistanê de, şehîd û birîndar kirin û tevî ku nayê înkarkirin ku vê yekê daxên giran danane ser dilê xelkê Kurdistanê, lê gelê me baş ji vê yekê têgihîştine ku nabe teslîmê wan siyasetên Komara Îslamî bibin û li karesatê de bimînin. Xelkê Kurdistanê da nîşandan ku tazîgirtî û destliserdestdanîn li mal de narûnê, belku bervajiyê xwesta Komara Îslamî, wan boneyan dikin çepera mafxwazî û nasnamexwaziyê û ne bi tenê xelkê asayî, belku me dît ku malbat û kesûkarên serbilind ên Şehîdan bûn ku li vê xebat û berxwedanê de li hember dujmin li rêzeya herî pêşiyê ne.

ewa ev û heval û kesûkarên şehîdên me ne ku bajar bi bajar û gund bi gundên Kurdistanê, meşxela agirê Newrozê hildikin û serçopiya rizgariyê dikêşin, her ev yeka remza mana hertimî ya xelkê Kurdistanê û xebata me ya rewa ye.

**Xelkê xebatkare Kurdistanê!**

Rewşa îsal ku derbas bû, tevî ku bo hemû xelkê Îranê tal û dijwar bû, lê Kurdistan her wek berê pişka bingehîn bela û binpêkirina sîêstematîk a maf berket. Li vê salê de hejarî bêkarî û bilindbûna nirxan bi qasekê givaş xistibû ser malbatan û hem dîsa bersiva her cure nerizayetîê û lihembersekinînên medenî yên xelkê, girtin û îşkencekirin, sepandina cezayên girtîgeh û bidarvekirina têkoşerên Kurd bû.

Komara Îslamiya Îranê bo sekinandina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê jî li hemû waran de ya ku ji dest hat, xwe neparast û bi hemû hêza xwe, cehd kir ku me bêxe tengasiyekê daku rêya xebat û tekoşîna me bide girêdan. Lê me hemûyan bi piştevanî û îlhamvergirtin ji hev, heta bo demekê jî li hember Komara Îslamî de me serî neçemand û xebat û tekoşîna xwe berdewam kir.

Civaka Kurdistanê bi xebat û tekoşîna medenî û nasnamexwaziyê, eva ku li hilbijartinên 11ê Reşemê û hilkefta Newroza îsal de da selimand ku ji her derfetekê mifah verdigrin û ji aliyê din ve jî, ne mûşekbaran û teror û ne çi cure givaşeke siyasî û ewlehî û astengîçêkirin bo têkoşerên siyasî, narawestîne û bi sedema piştevanîkirina hev, serbilind û wek hertim li çepera xebata mafxwazane de mane û alxahîn in ku tevgera siyasiya Kurdistanê li vê xebatê de dê serbikeve, lewma bi balkêşandin bi xweşmêrî û şanazî firandina vî heyamî a xelkê Kurdistanê, gelek bi cihe ku em şanazaiyê bi gel û ciwanên têkoşerên gelê xwe bikin û hivîdarê paşerojeke rohn bin û dest li nav destê hev û bi yekêtî û bi îlhamvergirtin ji Newroza Kurdistanê, xebata xwe heta serkevtina yekcarî, berdewam bikin.

Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, tevî nûkirina soza xwe digel we yên hêja, destê hevxebatiya we bi germî digivîşîne û careke din Newroz û sala nû ya Kurdî, li xwe pîroz dike
Bi hêviya serketin û azadî û rizgariya yekcarî ya gelê me.

**Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Newroza 1403 a Rojî**

# Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 8ê Mars, roja cîhaniya jin peyamek belav kir

**Jinên azadîxwaz ên Kurdistan û Îranê!**


**Xebatkarên vekhevîxwaz**

Bi hilkefta 8ê Mars, roja navnetewî ya jin, em bi germî pîrozbahiyê li we dikin û serkevtina xebata ve ya rewa li dijî çewsandin, cudatîdanîn û nevekheviyan, bi hivî dixwazin.

Rojhilatê Kurdistanê, meydana destpêkirina nûtirîn û mezintirîn serhildan bi dijî sitem û tawanên li hember jinan û landika dirûşma cîhangîr a "Jin Jiyan Azadî", dîrokek teybet li xebat û sekinîn li hember rêjîma kevneperest û dijî jin a rêjîma Îslamiya Îranê de heye. Li vê derheqê de xelkê Rojhilatê Kurdistanê û herwisa jinên li Îranê, dîrokek hevşêwe hene.

Hekî netewa bindest û mafxwaz a Kurd li Îranê, her ji yekem rojên hatinaserkar a rêjîma Îslamiya Îranê, şahidê dijayetiya vê rêjîmê digel maf û daxwaziyên wan bû, jinên li Îranê jî piştî 22ê Rêbendana 1357 a rojî anku 1979 a Zayînî ve, rastî destbiserdegirtina maf û azadiyên xwe hatin. Li heyama 45 sal temenê desthilatdariya rêjîma Îslamiya Îranê de vê rêjîmê ti demekê serkut û bêparragirtina netewa Kurd û jinên li wî welatî de piştguh nehavêtiye; Hevdem netewa Kurd li Îranê û jin li wî welatî de bi serîneçemandin û xweragirî û pêdegir li ser mafên xwe, her demê bûne kelemê nav çavê desthilatdarên Îranê û hemû dezgehên curbicur ên vê rêjîmê.

Asta bilind a yêkgirtin û hevxebatiya xelkê Kurdistanê û jinan li Îranê, piştî şehîdkirina "Jîna Emînî" ji aliyê geşta Îrşad a vê rêjîmê ve bû. Li dema canjidestdan û bi axpsartina "Jîna Emînî" li bajarê Seqizê û serîhildana xelkê Kurdistanê li dijî kuştina jinan û tawanên rêjîma Îslamî, bi beşdariya çalakvaneya keç û jinên biwêr li bajar û deverên din ên Îranê, serhildaneke mezin, seranserê Îranê li xwe girt, serîhildanek ku li dijî naveroka dijejinî ya rêjîma Îslamî û daxwazî bo vekheviya jin û mêr, li serweyî dirûşm û daxwaziyan bû; jin û keçên hişyar û biwêr jî li refên herî pêşve de bûn. Rêjeyeke zêde ji wan jinan li ser şeqaman kevtine ber destdirêjiyê û hatine şehîdkirin, an piştî birîndarbûn û girtinê, li jêr azar û îşkenceyan de canê wan ji wan hate standin, herwisa binçavkirina 100an kes ji wan jinan ku heta niha jî nehatine azadkirinê şahidiyê bo jêhatîbûna jinan li Kurdistan û Îranê de li ser xebat bo mafên xwe didin. Rûpeleke geş a din ji xebata jinan li Kurdistan û Îranê, xweragiriya wan dayîkan e ku keç û kurên wan li pêvajoya serhildana "Jin Jiyan Azadî"yê de bi sedema tawankariyên rêjîma Îslamî, hatine şehîdkirin, an ciwanên şoreşvanên wan li girtîgehêan de bi azardan û îşkence û bi sêdareyan, canê wan ji wan standin.




Dîroka 45 saleya xebata jinan li Îranê, digel yasa û desthilata kevneperesta rêjîma Îslamiya Îranê bi taybet bi beşdariya pêşengane û berfireha wan li serhildana seranseriya "Jin Jiyan Azadî"yê de, hilgirê vê peyama eşkere û rohn e ku ti guherîneke siyasî li Îranê, bê erêkirin û fermînasîna vekheviya jin û mêr û bê hilveşandina cudatîdanînên yasayî yên ku çavkaniya vê ji yasayên Îranê hatine vergirtin, serkevtî nabe. Jin bi berdewamî li 2 waran de bi pêdegirî tekoşînê dikin: ji aliyekê cehdê dikin ku tevî hemû astengiyên civakî û adetan, xwe pêbigihînin û li warê hizrî û nasîna pêgeha mirovahiya xwe, ya bi kêrhatiya xwe, ji jinên cîhanê pare nemînin, ji aliyê din ve jî bo guherîna rewşa sepandî bi ser jinan û afirandina rewşeke dilxwaz, xebat kirine.

Xuya ye ku desthiltbidestên rêjîmê û ragihandin û demûdezgehên curbicur ên wan, gelek cehd kirine ku pirsa jinan bi serqotkirin û avêtina kincan û xwerûtkirinê bidin nasandin. Cehdkirinên wiha, berî hemû aliyekê ew rêjîma bi xwe bi atybet Elî xamineyî yê rêberê vê desthilata dojehî, rastî rûreşî û abûrçonê û mezintirîn pirsgirêkan kiriye, çimkî hicaba bizorê, kirine pirseke "Heysiyetî" û kirine nîşaneya serwetirbûna otorîteya rêjîma Îslamî û kultûra kevneperestaneya xwe bo ser civaka Îranê. Bê heger nîne ku jin li Îranê de ew hêma û nîşane, kirine armanc û bi eşkere wan hêma û nîşaneyan red dikin.

Ew yeka ku jin li Îranê tevî hemû biryarên ecêb ên dezgeha dadweriya rêjîmê û hemû cehdkirineke tolhildanê ya meclîs û demûdezgeh û saziyên tepeserker ên rêjîmê li warê binpêkirina hicaba sepandî, bê hicaba bi zorê têne ser şeqam û cihên gîştî, lê ew bi tenê bi armanca redkirina wan cure hicaban nîne belku dijayetî û redkirina îdeolojî û tevahiya desthilata wan kevneperestan e.

Bo tevgera azadîxwazî li Rojhilatê Kurdistanê û hemû xelkê Kurdistanê, cihê şanazîkirinê ye ku mil bi milê wan xebat û dawîanîn bi sitema netewî, pirsa jinan her şan û pêgeha taybet bi xwe hebûye, hekî li Îranê de Xumêynî yê avakerê rêjîma îslamî û rêjîma wî û mîratgirên wî, 45 sal e hewla kêmkirina pêgeha miroviya jinan didin û bi navê ol, maf û azadiyên wan ji wan distînin, li Kurdistanê de 78 salan berî niha, "Pêşewa Qazî Mihemed", Serkomarê Komara Kurdistanê, handerê jinan bo avakirina rêkxistina taybet bi jinan û hatina wan bo nav karûbarên siyasî û perwerde û tekoşîna civakî bû.

10an Sal e ku jin li Kurdistanê de li warên cur bi cur de mijûlê terkoşîna hizbî û rêkxistinên siyasî yên xebatkar, li refa hêza pêşmerge û herwisa li xebata medenî û giştî de ne û bi awayekî çalakane, beşdariyê dike. Yekîtiya Jinên Dêmokrat a Kurdistana Îranê ku li 24ê Reşemeya 1324 a Rojî, beranber bi "15ê March 1946" a zayînî, hatiye avakirin, heta niha jî li tekoşîn û xebat bo mafên jinan ên Kurdistanê berdewam e û ew yek ji destkevtên tevgera netewî û azaîxwaziya Kurdistanê ye.

**Jin û mêrên vekhewîxwazî li Kurdistan û Îranê!**

8ê Mars, roja cîhaniya Jinan, hilkeftek bo bîranîna erkên me li derheq pirsa jinan li Kurdistan û seranserê Îranê ye; Derfetek bo nûkirina soz û peyman digel wan jinên qehreman e ku li hember dîktatorekî hov û kevneperest ê desthilatdar de sekinîn da ku rabigehînin ku serdema mêrsalarî û cudatîdanînên regezî nemaye. Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li vê rojê de tevî dubarekirina piştevanîkirina xwe li xebata jinan li Kurdistan û Îranê li dijî sitem û nevekheviya regezî, bi erkê xwe û tevahiya organ û rêkxirawên Hizbî û tevahiya endamên vê Hizbê dizane û tevî rêxweşkirin bo beşdarî û rola zêdetir a jinan li tekoşîn û birêvebirina rêkxiraw û damezraveyên Hizba Dêmokrat, girîngî bi pirsa jinan li nav civaka Kurdistanê û Îranê de bidin û piştevanê daxwazên wan ên rewa bin.

**Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**8ê Mars 2024**
**17ê Reşemeya 1402 a Rojî**
**Rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê**

# Rêzdar Mistefa Hicrî: “Rapora Komîteya peydakirina rastiyan, pêngaweke girîng e bona dubare nasandina rêjîma cinayetkar a Komara Îslamiya Îranê bo raya giştî



**Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li derheq belavbûna rapora Komîteya Peydakirina rastiyan a Rêkxirava Netewên Yekgirtî, peyamek belav kir.**

**Deqa peyamê wiha ye:**

Roja 8ê Mars, roja cihaniya Jinan, Komîteya Peydakirina Rastiyan a Şêwreya Mafê Mirov a Rêkxirava Netewên Yekgirtî, raporek li derheq 13 heyv cinayetên komara Îslamî li dirêjahiya şoreşa “Jîna”yê bi dirûşma “Jin Jiyan Azadî”yê, belav kiriye.

Li vê raporê de bas ji aliyên cuda ên tepeserkirin û kuştina xelkê û bikaranîna tundûtîjî bi rêya hêzên serkutkerên rêjîmê hatiye kirin û ew wek nîşaneyeke eşkere ji encamdana cinayet li dijî mirovahiyê binav kiriye.

Li beşeke vê raporê de bi hûrî îşare bi wê yekê hatiye kirin ku her ji yekem rojên tevgerê li bajarê Kurdistanê de rêjîma komara Îslamî, cehd kir ku xwenîşandanên aşitîxwazaneya xelkê wek tevgereke cudahîxwaz bide nîşandan, lewma civaka netewî û Olî yên weku Kurd û Belûç bi tundî tepeser kirin û li vê pêxemê de de jî çekên şer bi kar anîn.

Li vê raporê de zêdetir ji vî warî ve girîng e ku dide xuya hûrdekarî û şêwaza tepeserkirin, ne bi şêwaza rêkeft belku bi awayê sîstematîk û ji aliyê pileberztirîn berpirsên rêjîmê ve birayr bo hatiye dan û ahtiye cîbicîkirin.

Rapora Komîteya Peydakirina Rastiyan, rastiya berfirehiya tepeserkirin û bi kêmzanîna xwenîşanderan dide xuya û pêngawek girîng bo dubarenasandina rêjîma cinayetkar a komara Îslamiya Îranê bo raya giştî ye.

Li vê raporê de cihê destxweşêkirin û pêzanînê ye û ji her aliyek çavkaniyeke girîng û cihê baweiyê bo nîşandana dubare ya rûkê rastîn ê rêjîmê ye û ji aliyê din ve jî nîşanderê xweragirî û berxwedana netewên sitemdîtî û bi ytaybet xelkê Kurdistanê û jinên biwêr ên Îranê ye.

**Mistefa Hicrî**

**Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**10ê Adara 2024 a Zayînî**

# Peyama rêzdar Mistefa Hicrî bo salroja kîmiyabarana Helebçê




**Rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta 16ê Adarê, salvegera kîmiyabarankirina Helebçê ji aliyê rêjîma Beis a Êraqê ve, peyamek belav kir.**

**Deqa peyamê wiha ye:**

16ê heyva 3 a Zayînî, 36emîn salroja karesata komkujî û kîmiyabarankirina Helebçê ye, li vê rojê de sala 1988 a Zayînî de ji aliyê hikûmeta berê ya Îraqê vê bi bombên kîmiyayî êrîş bo ser bajarê Helebçê li başûrê Kurdistanê hate kirin.

Li encamê de gorî zaniyariyan nêzî 5 Hezar kes ji xelkê vî bajarî şehîd bûn û hezaran kesên dinê jî birîndar bûn.
Li vê bîranînê de em silavan dihinêrin bo rihê paqijê wan şehîdan û rêz û hurmeta me bo birîndarên vê karesatê û hemû xelkê dilbirîndarê Helebçê.

Ev roja, hemû wan cinayet û komkujiyan tîne bîra me ku dijminên azadiya netewa me li hemû beşên Kurdistanê de kirine û her yek bi şêwazekê heta niha jî her berdewam e.

Komara Îslamiya Îranê, mînakeke berçav ya wan cure hikûmetan e ku li destpêka desthilatdariya xwe de bi 10an hezar Kurd tenê bi tawana Kurdbûn û mafxwaziya wan, bi rêya komkujkirin, teror, birsîkirin, tûşkirin bi madên hişber û ... kuştine û hezaran kes ji çalakvanên siyasî yên Kurd xistine zindana û heta rehmê bi jîngeh, kultûr, ziman û dîroka wî xelkî jî nekirine.

Balkêş e ku ew rêjîma heta niha 10an cih ên niştecîbûna Kurdên Rojhilatê Kurdistanê, li Herêma Başûrê Kurdistanê de jî bombebaran kirine û bi hêcetên cuda, cihê niştecîbûna hejmarek ji xelkê wî beşa Kurdistanê jî kirine armanca mûşek û dironên xwe û bûne sedema kuştina jin û zarokan û malwîraniyê.

Tevî bîranîna qurbaniyên karesta kîmiyabarankirina Helebçê û hemû şehîdên Kurdistanê, em dibêjne hemî tawnbaran û bi taybet rêjîma Komara îslamî ku encama rêjîmeke tejî rojreşî bo xelkê, dê her ew encam hebe ku rêjîma bikerê tawana Helebçê rastî vê hat;

Lewma ew rêjîma nikare bê bikaranîna siayseta hinardekirina kirîzan bo derve û sitemkirin li xelkê, dirêjiyê bide temenê hikûmeta xwe ya dîktator û ya ku serdikeve, tevgera rewa ya xelkê ye.

**Mistefa Hicrî**
**Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**16ê Adara 2024**

# Newroz li panahiya nîştiman



N. Kerîm Perwîzî

Erdê devreke tam li dora Rojê zivirî, û dîsa di nuqteyek taybet de, xwezaya li ser Erdê rastî guherînek din dibe.

Li xala ku wek pozîsyona Biharê tê zanîn di gerra Erdê li dora rojê de, jiyana li ser rûyê erdê ji dil diguhere, bi taybetî li herêmên çiyayî yên Kurdistanê, li bilindahiya çiyayên Zagrosê, kevyên berfê dihelin û kulîlk vedibin, mizgîniya dawiya zivistanê dide.

Newroza xwezayê mizgîniyê dide û Newroza civakê jî vejîna xwezayê wek sembola hêviya rojeke nû tîne!

Ji dema ku gelên Rojhilata Navîn bi şaristaniya Mezopotamyayê nas bûne, merasîmên taybet ên sersala xweza û jiyana hevbeş û sersala vê herêmê bi bûyerên xwezayî re bûye yek, lewma sala nû li Kurdistanê tijî nûbûn e.

**Ev sembola nûbûnê, bi taybetî di vê dema ku Rojhilatê Kurdistanê di bin zulma hovane ya rejîmeke otorîter de ye, wateyek kûr digire û ji ber vê yekê em dibînin ku li Kurdistana ku her dem li ser piyan e, gel bi coş û kelecaniyekê pêşwaziya Newrozê dike.**

Rêûresmên berfireh ên Newrozê li deverên cuda yên Kurdistanê nîşana zindîbûna vî gelî û hestiyarbûna wan û sembola Newrozê û agirê pîroz ê Newrozê ji bo Nîştimana Kurdistanê ye.

Ji dema ku sîstema siyasî hewl daye reng, bêhn û tama etnîkên cuda yên Îranê ji holê rake û hemûyan di qalibeke destkurd de bi navê neteweya Îranê de bihelîne, her dem pîvanên çandî û nasnameya Kurd û Kurdistanê hatine talankirin, û hewl dane ku kincek din lê bikin û bifroşin Kurdistanê.

Di merasim û şahiyên Newrozê de hewl dane ku agirê Newrozê dagîr bikin û bikin tiştekî duyemîn û Newrozê bi rûniştina li malê li dora maseyeke bi navê heft sîn kêm bikin, ku ne rast e û ne jî di dîrokê de behsa wê hatiye kirin!

Lê belê merasimên Newrozê, pêxistina agir li bilindahiyan, pêşwazîkirina nûbûna salê, komkirina xelkê bajar û gundan li dora hev, pîrozkirina bi hev re û seredana kesên ku îsal mirovekî xwe ji dest dane, ji taybetmendiyên Newroza Kurdî ne!

Bi salan e rejîma kolonyalîst û piştre jî Xumeynî hewl dan ku sembolên me yên çandî bidizin û ji naveroka wan vala dikin, bi dehan salan e rejîma Xumeynî li dijî Newroza Kurdistanê bûye û heta agir pêxistinê jî wek guneh bi nav kiribû.

Lê belê dîrok nîşan daye û Kurdistanê careke din îspat kir ku divê desthilatdarî teslîmî rûyê dîrokê bibin û netew dê bimînin, lewra em dibînin ku piştî derbasbûna çendîn dehsalan dijayetiya desthilata zêdexwaz a Tehranê digel Newroza Kurdî, niha êdî berfirehiya merasimên Newrozê li Kurdistanê tê lidarxixtin û sembola xebatkarên wê jî tên bilind kirin, desthilatdariya zêdexwaz tenê bi rû reşya xwe bimîne!



**Newroz wek cejna sersalê dibe ku demek kurt bimîne û bi pêxistina agir û bilindkirina sembolên neteweyî û têkoşînê dîsa hêviyek bi mirovan re bê dayîn û desthilatdar jî wisa bifikire ku heta dawiya wê rojê rewş dê normal bibe!**

Lê tiştê ku ew nizane û kesên li wir li dijî îradeya rejîma desthilatdar û înkarker tevdigerin ev e ku Newrozê dikin bingehek ji bo hêviyê û xurtkirina têkiliyên civakî.

Dema Newroz li Kurdistanê tê pîrozkirin, hemû gel li dora agirê pîrozbahiyê diçe û ev jî ruhê xwe yê netewî nîşan dide û îspat dike.

Sînorekî ku agirê Newrozê lê tê pêxistin û gel li dora wê pîrozbahiyê lê dikin û sembolên neteweyî û têkoşînê bilind dikin, bi rastî jî sînorê welat nîşan dide!

Li vî welatî însan hene ku ji bo xatirê welat hebûna xwe ya herî bi qîmet canê xwe feda kirine.

Şehîdên Kurdistanê ew in ku bi xwîna xwe welat ava kirine û ji ber vê yekê jî sembola serbilindiya gel in di Newrozê de, civak ber bi mezarên wan diçin û serdana malbatên wan dikin, da ku ji wan re rabigihînin ku ev rêûrsim û ev nîştimana û ev zindîman, sembol, Ala neteweyî û berxurdarî û geşbûna van agiran, berhem û deyndarên xwîna şehîdan in û ev zarokên nemir in ku niha bûne meşaleyên rizgariya welatê xwe. .

# Yekgirtina netewî û hewcehiya siyaseta 360 pileyî



**N. Dr. Majid Hakki**



Pêdivî ye ku siyasetek neteweyî ya 360-pileyî were fikirîn da ku guhdarîkirin û çareseriyên dîplomatîk ên navxweyî pêşve bibin.

Şoreşa Jîna li Kurdistan û Îranê hem li ser asta navxweyî, hem li ser asta Îranê û hem jî li ser asta navdewletî wek katalîzor bû sedemek ji bo zelalkirina potansiyel û metirsiyên li pêşiya civaka Rojhilatê Kurdistanê.

Şoreşa Jîna nîşan da ku mixabin yekîtî û hevbendiyên berê yên di navbera hêzên siyasî yên Kurd de ne bi planeke stratejîk bûn û bi piranî ji bo dagirtina valahiya taktîkî ya pêwîstiyên pêkhateyên van “hevbendiyan” bûn.

Îsbata vê îdiaya min jî dûrbûn û şerê nerm piştî îmzekirina “Mensûra Mehsa”, berpirsyarnegirtina partiyan li hember xeletiyên xwe û dûrketina ji wan prensîbên ku partiyan bi xwe berê digotin, ne tiştek e.

Heya dema nivîsandina vê babetê, hewlên aliyên siyasî heta niha nebûne sedema nêzîkbûneke stratîjîk û dirûşmên wan ên yekrêziyê jî rengekî madî wernegirtine..

Ji bo ku cîhan me fêm bike û ji bo pirsgirêka me ya neteweyî piştgirîya cîhanî werbigire, pêwîstiya me bi yekîtiyê heye.

Ji bo ku em yekitiyê pêk bînin, pêwîstiya me bi têgihiştineke baş heye ku îmaja neteweyekê ji kê û çi pêk tîne. Mixabin lêkolîneke me ya ku çarçoveyeke teorîk û metodolojîk pêşkêşî bike tuneye ku li ser îmaja me ya siyasî ya tevgera neteweyî ya Kurd nêrînên biyaniyan analîz bike.

Li ser zirarên derûnî, civakî, mirovî û jîngehê yên ku ji ber parçebûna tevgera Kurdistanê derketine, lêkolînên me yên navxweyî nînin. Divê tevgera siyasî ya Kurdistanê girîngiya têgeha raya giştî û pêkhatina wêneyekî netewî bizanibe û ji bo reftarên xwe yên siyasî modeleke pîvanê binirxîne. Li ser vê bingehê ji bo naskirina daxwazên giştî yên civakê û xurtkirina dîplomasiya navxweyî pêwîstiya me bi amûrek nû û nûjen a bi navê guhdarî heye.

Tenê naskirina pirrengiya civaka Kurdistanê û pirrengiya siyasî nikare bibe sedema têgihiştinê, lê divê modelek xebatê nû bike ku tê de civakên cihêreng ên Kurdistanê wêneya welat ava bikin û di vê çarçoveyê de nirx û berjewendiyên hevbeş werin analîzkirin.

Ev nêzîkatî rê dide ku analîzek stratejîk were kirin ku ka têkiliyên dîplomatîk û cûdahiyên navxweyî çawa dikarin bibin alîkar ku wêneyek hemdem a Kurdistanê çêbibe.

**Pêwîst e em li ser peywendiya partiyan ji aliyê hejmar û kalîte ve, pêwendiya partiyên siyasî û civaka sivîl, hêz û lawaziyên van pêwendiyan û tevaya tevgera siyasî ya Rojhilatê Kurdistanê lêkolîn û gotûbêj bikin.**

Digel vê yekê, pêdivî ye ku em modelek pêş bixin da ku ajokerên nirxên hevpar ên di civakê de rave bikin da ku wêneya giştî ya civakê bi têgihiştinek lihevhatî vebêjin.

Bi van gavan em ê karibin nirxandineke realîst a civaka xwe bi dest bixin û girîngiya “guhdarî”kirina avakirina nirxên hevpar bihesibînin. Pejirandina siyasetek 360-pileyî pir hesas e û pêdivî bi pêwendiyek rastîn, rêveberî û peymanek civakî heye ku dikare bibe platformek ku ji paşeroja tengahî berbi pêşerojek saxkirinê ve biçe.

**Siyaseta 360-pile yek ji wan amûrên herî hêsan e ku meriv bandora helwest û kiryarên me li ser yên din fam bike û ka ew çawa tevgera me fam dikin. Psîkolojî alîkariya mirovan dike ku xwe nas bikin. . Lêbelê, ramanên polîtîkaya 360-pileyî dê ji me re bibin alîkar ku em xwe wekî mirovên din nas bikin.**

Bi siyasetek 360 pileyan, em dikarin bigihîjin tiştê ku jê re Kûpaya dîtina Cîhanê tê gotin. “ (Erênî: hişyar, erênî: bêhiş, neyînî: hişmend, neyînî: bêhiş) mîna pencereya “Johari” ye, lê balê dikişîne ser cûdahiyên têgihiştinê (têgihîştî) ji bo organîzekirina agahdariyan axên hinekî cûda bikar tîne. Paceya Johari modelek nîşankirina Astan e.

di reftarên mirovan de hişmendî. Model têkiliya kesek bi yekî din re di çarçoveya xaniyan de nîşan dide, ku her yek ji wan xaniyek pencereyek mezin e.

**Pejirandina sîyasetek 360-pileyî ji rêberên siyasî re dibe alîkar ku kapasîteyên xwe yên rêxistinî pêş bixin, hevkariyê bikin û derfetên nû ji bo hevkariyê, pêşkeftina rêxistinî û siyasî ya domdar peyda bikin û aştiya civakî pêşve bibin.**

Bi vî awayî, têgihîştina hevpar a dîtina nirxên hevpar û yekitiya di pirdengî de dikare were bidestxistin. Pejirandina sîyaseta 360 pileyan derfetan ji bo hemû aktorên siyasî yên Kurdistanê dirust dike, çawa ku xeleka 360 pile ji hêmanên curbecur pêk tê, xeleka siyasî ya Kurdistanê jî bi hebûna aktorên civaka siyasî dê temam bibe.

Di hawîrdoreke wiha de partî bi hev re hevrikiyê nakin, hevdu temam dikin. Hebûna yê din ne tenê ji bo hebûna me xeter e, di heman demê de ji bo mayîn û temambûna me jî pêdivî ye.

## Nerîna




**“Mistefa Hicrî”:**

**“Mistefa Hicirî: Newroz ji bo me kurdan ne tenê nûkirina salê û guhertina xwezayê ye. Her çend em Newrozê weke mîratek mirovî dihesibînin jî, lê em li ser baweriyê ne ku Newroz ji bo neteweya Kurd xwedî wateyeke siyasî ya cuda ye.”**




**“Mezlûm Ebdî”:**

**“Mezlûm Ebdî: Kampa Holê wekî bombeyeke ku dê biteqe! ”**



**“Emmanuel Macron” :**

**“Emmanuel Macron: Dibe ku em leşkeran bişînin Ukraynayê”**



**“Vladimir Putin”:**

**“Vladimir Putin: Pevçûnek rasterast di navbera Rûsya û NATO de dibe ku bibe sedema destpêkirina Şerê Cîhanê yê Sêyemîn”**

# Rojhilat ji Newroza bêmînak re amade ye!



**N. Eskender Ceiferî**



Newroza Meşxelên Rizgariyê, duyemîn Newroza hevdem ligel şoreşa Jînayê ye.
Li ba Kurdan, Newroz bûye sembola xebat ji bo azadiyê û têkoşîn li dijî dagirkaran.

Rêjîma Komara Îslamî ya Îranê, tevgera partiyên Rojhilatê Kurdistanê bi hûrî dişopîne. Niha piraniya van partiyan basa Newroza Meşxelên Rizgariyê dikin. Heya partiyeke Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, rêjîma Komara Îslamî jî nîgeran e.

Newroz bûye remza şoreşê. Di dîroka hevçerx de, ti yek ji wan desthilatên ku Kurdistan dagir kirine, nexwastine rêûresma Newrozê bi rengekî ciddî were pêşwazîkirin. Rojhilatê Kurdistanê jî parek ji vî welatê birîndar e. Komara Îslamî, weke rêjîma Pehlewî, riftarê bi Kurdan re dike û lehengên Kurdan tenê ji ber pêkanîna çalakiyekê bi dehan salan di girtîgehan de dimînin.

Niha dîsa Newroz e û bi vê hevgirtina mezin, dibe ku şoreşa Jînayê bikeve qonaxeke nû.

Aliyên siyasî yên Rojhilat, di salên derbasbûyî de li ser pêşwazîkirina hevpar li Newrozê lihev hatine. Belkî ev, zengila metirsiyê be ji rêjîma Komara Îslamî re.

Ji Ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, hemû partiyên Kurdistanî û çepgir ên Rojhilatê Kurdistanê li hev nêzîk nebibûn.

Piştî biryarên wan pratiyan di salên bihorî de, wate piştî pêşwaziya hevpar li Newrozê ji aliyê partiyên Kurdî ve, tevgereke mezin di nava Spaha Pasdarên Îranê de çê bûye. Ew ditirsin vê carê Rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan. Zanyariyên veşartî ji nava Spahê amaje dikin ku bajarên Sine, Îlam, Urmiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke ya hêzên wê rêxistina têrorîst. Bi vî rengî ku têrorîstên Sipahê, di nava xelkê sivîl de digerin û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku basa Newroza hevpar a aliyên Kurdî wate Newroza Meşxelên Rizgariyê bike, bê girtin.
Ew heman tirs e, ku rêjîmê ji vejîna serhildana Jînayê heye.

Ji xeynî cehdên Spaha Pasdaran, selefî jî li hemberî netewexwazên Kurd têne çalakkirin. Plana herî dawî ya Îranê ew e ku derfetê bide rêxistinên tundrew da ku mafxwazên Kurd di landikê de bifetisînin.

Li gor zanyariyên çavkaniyeke veşartî ya saziya Îstixbarat angu Îtilaata Îranê, eger tevlîhevî an jî serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî desthilata rêjîmê de çê be, dibe ku ji bo dijatiya hêza Kurdan, mifah ji aliyên selefî jî were wergirtin.

**Lê niha êdî piştî salek û nîvan ji destpêka şoreşa Jînayê û bi cangorîbûna nêzî 150 kesan ji xelkê Kurdistanê di serhildanê de, xelkê Kurdistanê nîşan daye ku ewê di çepera şehîdan de bimînin. Niha ew dixwazin Newroza Meşxelên Rizgariyê jî bikin derfet ji bo rabûnê.**

Her Newrozek, ji bo Kurdan rêfrandûmeke serxwebûnê ye ku li dijî Tehranê li hemû navçe, gund û bajaran pêk tê. Aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê wisa dibînin ku qet li Îrana di bin desthilata Komara Îslamî de, hilbijartineke dêmokratîk û azad birêve neçûye û ew hertim hilbijartinê baykot dikin, lê belê Newroz, mezintirîn bijarde û hilbijartina Kurdan e.

Li gor wan, her sal Kurd di Newrozê de biryara xwe li dijî dagirker distînin û soza xwe bi rêbaza şehîd û cangoriyên niştiman re nû dikin.

Li bendê ye ku careke din, rêfrandûma serxwebûna Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê tevahiya partiyên Rojhilatê Kurdistanê ve bi rêve biçe.

Her sal wisa bû yek ji wan, sloganek ji bo azadiya niştiman hil dida. Lê îsal, slogan, Newroza Meşxelên Rizgariyê ye. Taktîkên wan aliyan cuda ne. Lê armanca hevpar, dibin sedem da ku hemû, hevdeng, bang li neteweya Kurd bikin heya dakevin kolanan û bi dîlan û dawetê, kela dagirker bihejînin û car din jê re bêjin ku evder welatê me ye û em ji bo pêkanîna tevgeran li ser axa xwe, îznê ji ti kesekî naxwazin û Newroza me, dengê dijatiya me ya li hemberî dagirker e. Ev Newroz, Newroza Meşxelên Rizgariyê ye.

Êdî çiyayên Zagrosê, hemûyan dest dane hev û ji Agirî, heya Bozê Sîna, ji Kêleşîn heya Arbaba û ji Dalaho heya Qendîl, dengê pêşmerge di nav keç û xortên Kurd de reng vedide û ewê bi peşqelê agir û roniya rojê û bi tîrêjên dilên dayîkên şehîdan biçin pêşwaziya Newroza Meşxelên Rizgariyê û zêdebarî hemû rêwşûnên tund ên ewlehî ji aliyê rêjîmê ve, nêzîkatiya xelkê bi mijarê re germ e û
rêferandûma me wê di dema xwe de birêve biçe.

Lewma jî dilê xelkê xweş e û ew geşbîn in ku dê Newroza Meşxelên Rizgariyê, car din serhildana Jînayê bi gurrtir bike.

# Şeş sal li ser dagîrkirina Efrînê derbas bûn



N. Ebdûlezîz Qasim



Herêma Efrînê, piştî dagirkirina wê di 18ê Adara 2018an de, bi awayekî sîstematîk rastî komkujî û tawanên dijemirov û bişaftin û guhertina demografî dibe, ku piraniya xelkê wê yên kurd hatine koçberkirin û li kampên bêserûber li Helebê dijîn, li ser mal û milkên kurdan Ereb û Turkmen tête bicihkirin, ji bilî tawanên rojane yên erebên hawirde û rêxistinên îslamî yên terorîst yên girêdayî Tirkiyê.

li gorî amarên Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan, ku di 6 salên dagîrkeriya li ser herêma Efrînê, zêdetirî 310 hezar welatiyên kurd, bi rêjeya (%56) xelkê Efrînê ji ber zordariya komên çekdar yên ser bi Tirkiyê ve hatine koçberkirin.

di heman demê de ku mal û milkên wan hatine desteserkirin û herwiha ku li gorî amarên heman çavkaniyê ku 4476 malbatên Ereb ji Filistîniyan û Erebên Şamê û Idlib û Dêrazorê li herêma Efrînê hatine hawirdekirin.

Bi kurtî dikarin bêjin ku hemû reng û şêweyên tawanên dirinde li dijî miletê kurd heta li dijî zevî û daristanên Efrînê têne pêkanîn ji bo bidawîkirina hebûna miletê kurd ji aliyê komên çete yên girêdayî wê ve, yên ku bi navê (Artêşa Niştimanî) tên nasîn.

Bi taybetî li meha Adarê û di cejna Newrozê de, ku tawanên dijekurd li herêma Efrînê û navçeyên dagîrkirî bi piştgiriya artêşa Tirkiyê ya dagirker zêde dibin, ku li par (sala çûyî) çar welatiyên kurd li şeva Newroza 2023an li ser destê erebên hawirde hatine şehîdkrin û îsal jî bi şêweyekî dirinde zarokekî kurd yê jiyê wî 16 salî bi navê (Ehmed Medê) li ser destê çekdarên hawirde û dagîrker hate kuştin.

**Ev tawan dubare dibin di demekê de ku rojane welatiyên kurd ji aliyê erebên hawirde û çeteyên Tirkiyê yên bi navê (opozîsyona sûriyê) rastî binpêkirin û destdirêjiyan dibin, ku mal û milkên kurdan li xwe helal dikin wekî barmite û (xenîme) bi destûra rêxistinên Islamî yên terorîst bi piştevaniya bêsînor ya artêşa Tirkiyê ya dagîrker.**

Tevî oparsyonên guhertina demografik di heman demê ku jiyana xelkê kurd li herêma Efrînê û li navçeyên din yên dagîrkerî di metirsiyeke mezin de ji ber tawanên rojane yên bi armanca qirkirina gelê Kurd li jêr hikum û zordarî û deshilata rêxistinên çekdar yên kirêgirtî ku li ser motêda “DAIŞ” hatine damezrandin.

Tevî ku di van şeş salên dagîrkeriyê de, ji aliyê rêxistinên navdewletî û yên mafên mirovan ve, tawanên li dijî xelkê Efrînê û li dijî gelê kurd hatine şermezar kirin, herwiha ku di nûtirîn raporeke Komîsyona Lêkolînê ya Neteweyên Yekbûyî de li ser Sûriyê ku di 11ê Adara 2024an de hatiye weşandin.

têde Tirkiyê bi pêkanîna êrîşên li dijî sivîlan û navendên xizmetguzariyan hatiye gunehbarkirin û têde hatiye ku ew tawan digehêjin li asta tawanên şer, lê tevî wisa jî hevdem ku tawanên hovane yên komên çekdar û artêşa Tirkiyê li dijî gelê Kurd li kurdistana Sûriyê nehatine rawestandin û hêjî berdewam dikin.

Ji ber vê yekê divê sazî û rêxistinên kurdan bi awayekî rasteqîn bo dîtina çareseriyeke bilez rawestin û bi taybetî revenda kurdî li derveyî welat ku bi erkê xwe rabe bo zêdekirina bizav û çalakiyên xwe bo pitir guvaştinê bêxin li ser navendên biryardanên navdewletî û rêxistinên mafên mirovan û civaka navdewletî

ku bi awayekî cidî rabin bi erkên xwe ji bo parastina welatiyên kurd li Efrînê û Serêkaniyê û Girêspî û li tevaya navçeyên Kurdistana Sûriyê, yên ku rojane ji aliyê artêşa Tirkiyê bi drone û balefiran têne topbaran kirin.



# Kurtenivîsek li ser danasîna Yekîtiya Jinan



**Mojigan Elîpûr**
**W: Hesen Mukerem**



Yekîtiya Jinan 78.mîn salvegera xebat û têkoşîna xwe derbas kir. Ev rrêxistina han 52 rojan piştî ragihandina Komara Kurdistanê ji aliyê Pêşewa Qazî Mihemed ve hat damezrandin.

Di wê demê de ev mirovê jîr û zana mijûlî damezrandina organên hikûmeta netewî ya Kurdistanê bû, hewcehî bi beşdarbûna jinan di rêvebirina welat de dît.

Ji ber vê yekê wî û hevalên xwe yên hevhizir di 24'ê Reşemeya 1324'an a Rojî de bi pêşengiya Mîna Xanima Qazî (Îskender) Partiya Demokrat a Jinên Kurdistanê rêberî û piştgirî kirin. Paşê navê partiyê bû Partiya Yayan.

Damezrandina vê partiyê îro li Rojhilatê Kurdistanê weke yekemîn rêxistina jinan û keçan dema ku zêdetirî %90 civaka Kurd nexwendewar bû, di bin pêla zilamsalarî, eşîrtî û newekheviyê de dest bi têkoşîna xwe kir.

Lê helwesta Pêşewa ya mezin nîşan dide ku wî çawa ji hevjîna xwe xwestiye ku berpirsiyariya yekemîn rêxistina jinan bigire ser milê xwe

Wî hem jin û hem jî keç teşwîq dikirin ku malên xwe derkevin û di rêvebirinû karên îdarî de pişkdar bibin, ji ber ku wî demî ev yek ecêb bû, û tê îdiakirin ku di ger û hevdîtinan de jî keçikek hertim pêra bûye.

Têkoşîna rêxistina jinan evnêzîkî 8 dehkin li ser temenê wê de derbas dibe, di qonaxa yekem a çalakiyên xwe de, di dema hebûna Komara Kurdistanê û piştgîriya yasayên kêrhatî yên Komara Kurdistanê de bû.

Divê jin û keç bê cudahî di navbera kur û keçan de derbasî dibistanê û zimanê xwe yê zikmakî hîn bibin. Jin û keçan di rojnameya Kurdistanê de bi nivîsandin û axaftinê pêşketina bilez a civaka me ya paşverû nîşan didin.

Li paytexta Komara Kurdistanê Mehabadê jî jin û keçan ji bo birêxistinkirina çalakiyên xwe şiwreyên kolanan ava kirin.

Bi komkirina alîkariyên aborî û amadekirina hinek pêdiviyên Pêşmerge bi dirûtina destan gelek çalak bûn di alîkariya Hêzên Pêşmerge (Spaha Milî) de.

Mixabin qonaxa yekem a tekoşîna jin û keçan bi rûxandina Komara Kurdistanê ya pitik bi hîle û kiryarên bereday yên hikûmeta navendî û piştevaniya hêzên wek Amerîka û Brîtanyayê bi dawî dibe.

Qonaxa duyemîn vedigere serdema desthilatdariya Pehlewiyê II (Mihemed Riza Şah) ku destûr nedan jin û keçên Kurd xwe birêxistin bikin. Lê belê jin û keçên ku di dema komarê û nifşên din de çalak bûn, bêhtir bi awayekî takekesî û carinan jî bi awayekî komî ji wan derfetan sûd wergirtin. Nemaze di dema Mûsediq û tevgera gundiyan a herêma Çomî Mecîd Xan ji bo piştgirîkirina serhildana sala 1331`an a Rojî de û piştre çalakiyên çandî yên wekî beşdarbûna çîrokên şevê yên radyoyê, pêşbirkên dîlanê yên li televîzyona Mehabadê, pêşbirkên govendê li dibistanan, zanîngehan herçend ku asta beşdariya wan kêm bû.

Heta demsala Bihara sala 1357'an a Rojî ku termê nemir Ezîz Yûsfî li Mehabadê hate veşartin û di heyama sê rojên xwenîşandanên tund ên li dijî rejîma dîktator de, jin derbasî qonaxeke nû ya têkoşîna xwe bûn. Li Mehabadê heft keçan rêxistinek ava kirin û kovarek derxistin.

Di vê derbarê de endamê Komîteya Zagrosê Ebdullah Hesenzade behsa damezrandina Yekîtiya Jinên Mehabadê dike, li Seqiz û Merîwanê rêxistinên biçûk yên jin û keçan hatin avakirin ku bi awayekî çalak beşdarî meşan bûn.

Li hemû demên Komara Kurdistanê heta rûxandina rejîma Pehlewî ya duyem, jin û keçên têkoşerên demokrat, çi li Başûrê Kurdistanê ya îroyîn û hem jî di nav civakê de, alîkariya jiyana girtiyên siyasî kirin, bi taybetî di dema tevgera Pêşmerge ya salên 1346-1347an de parek bûn ji wê xebat û têkoşîna jiyanê.

Qonaxa sêyemîn a çalakiyên Yekîtiya Jinan piştî serkeftina şoreşa gelên Îranê bû. Li çend bajarên wek Mehabad, Bokan, Şino û Serdeştê komîteyên jinan dîsa dest bi têkoşîna xwe ya aktîf kirin û dest bi endamtiya Partiya Demokrat kirin. Di wê demê de bi biryara partiyê û wêrekiya Yekîtiya Jinan çendîn mijarên weke zewaca bi zorê ya keçan, marewergirtin, jin bi jinî, zewaca keçên temen kêm digel zilamên bi temen ve hatin qedexekirin. Ev yasayane ku di beşa civakî ya partiyê de hatin erêkirin û bi awayekî cidî hatin bicihanîn, ji bo jin û keçan piştgiriyeke baş bû û ber bi wekheviyê ve pêngavê dihavêje.

Rejîma nû bi taybetî piştî damezrandina Komara Îslamî ku piraniya xelkê Kurdistanê beşdarî referandomê nebûn, givaşek tund xistin li ser Kurdistanê û dest bi êrîşeke seranserî a leşkerî li dijî hat kirin.

Di beşdariya berevaniya gel de jin li bajaran û piştre li gundan ji bo parastina maf û azadiyên xwe tevlî refên Pêşmerge bûn û dest bi têkoşîneke dirêj û piralî kirin ku îro jî didome.

Di vê heyamê de ku ji du heyamên berê dirêjtir e, Yekîtiya Jinên Demokrat a Kurdistana Îranê li gel Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li çiya û bajaran, bi lidarxistina 3 konferans û 5 kongreyên xwe li Başûrê Kurdistanê û lidarxistina pitir li 10 konferansan li komîteyên derveyî welat ûendamtiya Şêvreya Jinên Sosyalîst a Navneteweyî, bi awayekî sîstematîk û rêxistinkirî,Kar û xebatên xwe dimeşîne. Herwisa hewcehî bi gotinê ye ku Cîgira Seroka Enternasyonala Jinên Sosyalîst a Rojhilata Navîn û Kafkasyayê
Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê ye.

Qonaxa nû ya Yekîtiya Jinan piştî Serhildana Jînayê, û şoreşa Jin, Jiyan,Azadî ku di 16'ê Îlona 2022'an a Zayînî (27'ê Xermanan 1401'an a Rojî) de dest pê kir.

Pêşî piraniya Kurdistanê, piştre piraniya Îranê û piştre jî bi deh hezaran kes li derveyî welat beşdarî wê bûn, ku ev yek xaleke werçerxanê ye di dîroka jin û keçan de li Îranê bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê.

Vê şoreşê jinên ji neteweyên cuda li Îranê li cihekî ku jin bûn anîn cem hev û di heman demê de derfet da jinên kurd ku kok û şiyanên xwe yên dîrokî nîşan bidin û daxwaz û daxwazkariyên xwe di vî warî de bînin ziman û rola sereke hebe.

Pirsgirêka nasnameyê ye ku ji bilî azadî û mafên neteweyî, di nav civakan de, bi taybetî di medyayê de, wekhevî û zayendî pêş dixe
.
Ji bo vê şoreşê ne tenê jin, divê hemû hêz û aliyên siyasî û sivîl jî li ser formulekirina rengekî din a têkoşînê bifikirin da ku li gorî peyam û naveroka peyamên jiyanê bin.

Yekîtiya Jinan niha ji her demê zêdetir li ser pêşxistina pirsa jin û keçan li Rojhilatê Kurdistanê, ligel rêxistinên din ên jinan ên di vî warî de çalak e.
Ji ber ku di xebat û têkoşîna xwe de xwedî ezimûneke xuya û berçav e ku bandor li şoreşa Jînayê de jî hebû.

# Bidin Hev Dest Û Milan



**N. Serbest Urmiye**

Têgeha neteweyîbûn û netewexwaziyê di civakê de , li gor hizir û têgihîştina endamên civakê, girêdayî rewşa welat û civakê ye. Dema ku di welatekê de gel ber bi rûyê metirsiyê li ser şûnas û hebûna xwe hat, şûnasxwazên civakê bizava netewexwaziyê di civakê de pêş dixin û bihêztir dikin. Ji ber ku di pêvajoya şûnasxwaziyê di civakê de, her tim hewila gihîştin bi yekîtiyê tê dan û bi yekîtîya gel rêya çareserkirina arîşe û pirsgirekên hindur yên civakê tê şopandin. Di heman demê de jî hêleke diyar di navbera civaka xweyî û bîhanî de tê keşandin.

Şûnasxwazî di civakê de girêdayî faktorên erdnîgarî, siyasî, dîrokî, aborî, çandî û perwerdehiyê ye û di rêya şopandina nirx, sembol, dîrok, efsane û kevneşopan de ku bomayî(mîrat)ên civakê nê, şûnasa xwe ya neteweyî didin nasandin ku asta bilind ya pêvajoya şûnasxwaziyê tê naskirin.

Li gor vê destpêkê hewil tê dan ku rewşa civaka rojhilatê Kurdistanê bê şirovekirin. Di du salên bihorî de bûyerên ku Rojhilatê Kurdistanê de hatin tomar kirin, rastiya gotinê ku di destêpkê hatine kirin, kifiş dikin.

Piştî kuştina keça Kurd li Tehranê bi terzê zorê û piştgîriya gel ji dadxaziya malbata wê, serhildaneke berfireh welat girt. Di vê serhildanê de aliyên cuda derketin û meydana serhildanê li dijî rejîma Îslamî ya Îranê, seranserî Kurdistanê û pareke zêde ji Îranê jî girt û bi navê şoreşa "Jîna" rêbazeke nûjen wate"Jin, Jiyan, Azadî" afirand. Lê dema ku pênase, silogan û armancênn serhildana Şoreşa "Jîna"yê di civaka seranserî ya Îranê û bi taybetî civaka Fars ya navenda Îranê de hemşêweyê civaka Kurdistanê nebûn yan di hin derfetan de meşeke berwajî dan pêşiya xwe, gelê Kurd hêleke taybetî bo serhildanê li gor taybetmediyên civaka Kurdistanê bo Şoreşa "Jîna"yê pênase kir û dengê bilind ê şeqamên Kurdistanê yê" bi eşkere da xuyakirin ku armancên serhildanê di Kurdistanê de bilindtir in. Ji bilî vê hindê jî, ferq û cudahiya terzên serkut û reşkujiya rejîmê di Kurdistanê û navenda Îranê de, bû heger ku pêvajoya şûnasxwaziyê di civaka Kurdistanê de hest bi metirsiyeke nû li ser hebûna xwe bike, lew-



ma di demeke kin de civak yek xist û bi nasnameyeke civakî û neteweyî ya cuda ji nasnameya civaka navendî serhildana han pênase kir. Siloganên " heta Kurdek bimîne, Kurdistan jî dimîne" yan " Kurdistan, goristana faşîstan" ku seranserî Kurdistanê de bûne dengê şeqamên azadîxwaz, wê rastiyê diselimînin.

**Bizava şûnasxwaziya civakî piştî şoreşa "Jîna"yê derbasî berxwedaneke neteweyî bû û yekîtiya gel bo çareserkirin, derbasbûn û hevparkirina arîşe û êş û janên civakê berhema xuya ya vê bizavê ye. Nimûneya herû berçav jî xesareta can ji destdana sê çiyagerên Kurd yê bajarê Nexedê bû ku meşa dîrokî ya beşdariya gel di peydakirina term û hevxemiya malbatên wan de, kêm wêne bû.**

Di aliyeke din serbarê boykutkirina hilbijartinên gera dozdan ya Meclîsa Şêwra Îslamî ya Îranê, ji aliyê hêz û navendên siyasî yên Kurd ên dijberî rejîmê di Kurdistanê de, dema ku rejîmê bo li dijî hev berdana Kurd û Azeriyên bajarên weke Urmiye, Nexede, Selmas, Makû û Xweyê di parezgeha Urmiyê de, ji pirsa şûnasê weke pîlan mifah vergirt û dest havête piropagendên şerxwaz, civaka Kurdistanê, nasnameya neteweyî ya bajarên han da selimandin. Ev pêngeha gel ji du aliyan vet ê şirovekirin. Ya yekê eva bû ku rejîmê bi taybetî piştî serhildana "Jîna"yê hemû hewla xwe dida neteweyên din yê Îranê li dijî Kurdistanê han bide û parezgeha Urmiyê jî bi akincîbûna du neteweyên Kurd û Azerî, derfeteke baş dida rejîmê bo serkewtin di pîlana han de û hewil dida ku wan deverên han ji herêmên din yê Kurdistanê veqetîne û bide xuyakirin ku tevlî serhildan û yekîtiya gelê xwe nabin.

Ya duyê meşa tundajo ya Azeriyan û nemaze alîgirên "panturkîzm"a tundajo ye ku ji aliyên derve yên herêmê ve û heta mirov dikare bêjê ku ji aliyê navendên sîxorî û ewlekariya rejîma Îranê ve jî li hember Kurdên akincî yên parêzgeha Urmiyê de, tên piştevanî kirin. Bizavava şûnasxwazî di civakê de serkewt û bo careke din şûnasa neteweyî ya vê axê û herêmê da kifiş kirin.( Helbet qala rastî û piştgiriya hilbijartinên rejîmê di vê basê de aliyeke cuda ye ku nahê pesendkirin û armanca gotarê jî dana meşrûiyetê bi rejîmê nine.)

Di pêngeha nû de, pêşwaziya gel li Newrozê ya ku îsal bi Newroza "Meşxelên Rizgariyê" ji aliyê rêxistiên sivîl ve hatiye bi navkirin. Pêşengî û pêşwaziya gel û yekgirtin bo parastina nasnameya neteweyî ya Newrozê, bizaveke li hember piropagendeyên hemû aliyên ku hewil didin nasnameya Newrozê biguherin yan jî di bin siya hin baweriyên olî û ..., rûmetê newrozê aloz bikin. Di vir de meşa gel hilgirê du peyamên serke ye. Ji ber ku hatina Newrozê îsal hevdem bû bi hatina meha pîroz a Remezanê û serbarê piropagendeyên aliyên mesebî, nemaze melayên şîie yên girêdayê bi rejîma Îranê ve li dijî Newrozê û anîna hedîs û gotinê olî bo alozkirina rûmetê Newrozê, gel da xuya kirin ku nasnameya neteweyî bilindtir e û di heman demê de jî rêzê ji baweriyên olî yên civaka xwe digire. Lewma berî hatina meha pîroz li cem oldaran, rê û resmên Newrozê lidarxistin.

Ji aliyeke din ve berfirehbûna rê û resmên Newrozê û pêşwazî û beşdariya berçav û dîrokî ya gel di Kurdistanê de , di hember nebûn û xemsariya herêmên navendî yên Îranê de ku di hewla guherîna nasnameya Newroz a Kurdî de ne, da eşkere kirin ku Newroz ji bilî Kurdbûnê çi nasnameyeke din vernagire.

Di dawiyê de, di cihê xwe de ye ku helbestvanê Kurd "Rizaliyê Reşîd" were bîranîn ku dibêje:

**Hezar, hezar qebîl û ber**
**Ser axa me saz kirin şer,**
**Weke berfa sîngê Sîpan**
**Helîyan, dîsa çîyayên me man.**
**Hezar, hezar car par kirin,**
**Hezar, hezar nav lê kirin,**
**Tofanê şûşt, ew tev birin,**
**Dîsa navên qedîm ser man.**

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê li hayama sala 2023 de zêdetir ji 216 zarok binçav kirine




Li heyama sala 2023 de zêdetir ji 2 hezar û 353 hevwelatî ku nasnameya wan hatiye zanîn, ji aliyê hêzên ewlehî yên rêjîma Îranê ve hatine binçav kirine ku 216 kes ji wan zarok û 325 kes jî jin bûne.
Pêka rapora "Hengaw"ê, li sala 2023 a Zayînî de hêzên ewlehî yên rêjîma Îranê zêdetir ji 2 hezar û 353 hevwelatî ku nasnameya wan hatiye zanîn, binçav kirine ku 216 kes ji wan zarok û 325 kes jî jin bûne û zêdetirîn rêjeya binçavkirinê li asta parêzgehan de li parzêgeha Sîstan û Belûçistanê de beûye ku hejmara wan zêdetir ji 588 halet bûye.
Herwisa li vê amarê de hatiye ku zêdetirîn binçavkirin ya welatiyên Kurd bûye ku rêjeya haletên tomarkirî hezar û 29 halet bûne ku %44 a tevahiya rêjeya binçavkirina li Îranê de li xwe digre.
Pêka amara "Hengaw"ê binçavkirina zarokan ji aliyê hêzên ewlehî ve %9 û ya jinan %14 a tevahiya binçavkrinan li xwe digre.
Herwisa temenê hejmarek ji zarokaên ku hatine binçavkirin ji 2 salî heta 10 salî bûne û ji li gelempera zarokên binçavkirî 10 keç û 201 jî kur bûne.
amara serast gelek ji vê zêdetire û gelek kes ji aliyê hêzêpn ewlehî ve hatine bêseûşûnkirin ku kes qedera wan an nasnameya wan nizane û rêjêm vê yekê perdepoş dike.

## Hizba Dêmokrat tirora Şoeiyb Zarieî mehkûm dike




Navenda Îdarî a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi belavkirina daxûyaniyekê, tirora Şoeiyb Zarieî ji aliyê tirorîsma rêjîma Îslamiya Îranê ve mehkûm dike û daxwazê ji navendên ewlehî û îdariye Hikûmeta Herêma Kurdistanê dike ku ji xebatkarên siyasiye Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê ku li Başûrê Kurdistanê dimînin, parêzvaniyê bikin.
Deqa daxûyaniyê wihaye:
Herwekî li daxûyaniya Komela Şorişgêr a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê de hatiye, piştî nîvroya roja Şemiyê 16ê Adarê, Şoeib Zarieî, Pêşmergê Komelê li nêzîk Zirguzê bi kevte ber êrîşa tirorîstekî rêjîma Îslamî û hate tirorkirin.
Tirora Şoeib Zarieî çwarimîn tirora xebatkarên siyasiye Kurdên Rojhilatê Kurdistanê ye li heyamê çend mehên derbasbûyî de, roja 16ê meha Pûşpera Îsal 2 endamên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi navên Luqman Acî û Adil Muhacir li gundê Helşoyê girêdayî bajarê Qeladizê, û herwisa li 20ê Pûşperê jî endamekî dinê ye Hizba Dêmokrat ni navê Siyamend Şaboyî li nêzîk bajêrokê Behrikê li nêzîk Hewlêrê bi destê tîmên tirorîstiye rêjîma Îranê hatine tirorkirin.
Herwekî li daxûyaniya Komelê de hatî û Hizba dêmokrat ji li daxûyaniyên pêşdaye xwe li derheq 2 kiryarên tirorîstiye komara Îslamî li meha Pûşperê de bas kiribû ku nabe li herêma kurdistanê de rê û derfeta livlivîn û encamdana kiryaran bidne tîmên tirorîstiye rêjîma Îranê, lewma em daxwazê ji aliyên siyasî, ewlekarî û yasayî ên Hikûmeta Herêma Kurdistanê dikin ku parêzvaniyê li canê xebatkarên siyasiye Rojhilatê Kurdistanê bikin û li hember kiryarên tirorîstiye rêjîma îslamiya Îranê de bê helwêst nemînin, Herwisa bi girtina bera rêkarên ewlehî û yasayî hem encamderên wan cinayetane aşkera bikin û hem rê ji ducarîbûna wan bigrin.
Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî mehkûmkirina tirora Şoeib Zarieî û şermezarkirina tirorîzma rêjîma Îslamiya Îranê, hevxemiya xwe bi malbat û hevçeperên kak Şoeib Zarieî û komela Şorişgêr a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê radigehîne.
Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê
**Navenda Îdarî** **17ê Adara 2024 an**

## Kolberek bi sedema kûrahiya birînên xwe canê xwe ji dest da



Şeva Pêncşemî 24ê Reşemê, Eta Husênî kolberê ciwan xelkê Belebizan ya ser bi bajarê Pawe, bi sedema dijwariya birînên xwe li nexweşxaneya Taliqanî a Kirmaşanê de canê xwe ji dest da.

Roja Çarşemî 16ê Reşemê, ew kolberê 32 salî bi teqeya hêzên Intizamî yên hikûmetê li ser sînorê Şoşmê gule bi singê wî keftibûn û bi dijwarî birîndar bibû.

Ew kolber despêkê bi mebesta wergirtina tedaviyên pizîşkî bo navenda dermanî a Newsûdê hatibû veguhastin ku bi sedema dijwariya birînên xwe li nexweşxaneya Qudis a Pawe bo nexweşxaneya Taliqanî hatibû veguhastin..

Eta Hûsênî xîzandar û bavê zarokekê bûye.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (466)

